




## Dîmenê Kurd di Romana Karl May de



### (Di nav Kurdistanana asê re)



Berî niha bi demekê, min ji xwendevanan re, ewên ku bi Almanî nizanin, li ser dîmenê Kurd, di du romanên almanî de, nivîsandibû, ya **George Halban (Malikê gur)** û ya **Yûsif Niyarî (Nêçîra dawî ya Nîmrod)**. Ewê dixwaze li wan vegere, dikane wan di malpera min ([Kurdax](#)) de bibîne. Ezê niha jî li ser romana **Karl May (Di nav Kurdistanana asê re)** gotarekê binivîsim, da em di nînika xelkê re dîmenê xwe yê neteweyî bibînin, ji wê dîtîne bêtir başî û nebaşiyên xwe binasin, xwe pêşve bibin û dîmenê xwe hîn hêjatir di jîhanê de belav bikin.

Ezê piçekî bi firehî vê gotarê binivîsim, ji ber ku ev roman di jiyana fantazî ya zarokên alman de sireke mezin dilîze, wekî hemî pirtûkên di yê nivîskarê wê **Karl May (1842-1912)**, ku gelek filmên sînema li ser binyada berhemên wî hatîne çêkirin, û navê **Wînîto yê Îndiyanî** ji wan filman li ba gelek zaroyên jîhanê jî hatiye naskirin.




Wînîto 1879

**Karl May**, wekî tê gotin, bi xwe hîç Kurdistan di jîna xwe de nedîtibû, lê dîsa jî gava yek romana wî (**Durch wilde Kurdistan**) dixwîne, ku em dikanin bi vî sernavî jî werbigerînin (**Di Kurdistanana hov re**), mirov ji xwe dipirse: “*Gelo, rast ev kese tew neçûbû Kurdistanê?*” û rast jî **Karl May** weku kesekî ku li nav gel û nîstê me geriyaye, ev roman lêkiriye, wekî çewa ew neçûbû nav Îndiyanin Amerîka, hema çend romanin baş li ser wan û welatên wan, li ser dîrok û serohat û olên wan nivîsandine...

**Karl May** 73 pirtûkên balkêş li şûn xwe hêştin, bêtir roman û rêwîname û pirtûkên bo lawan in, li ser Îndiyanîyên sor û Meksîkiyan, li ser gelên Balkan, li Ser Kurd û Turk û Ereb û

Farsan, û li ser ên Gonê (Cinn) jî, ku romana wî Erdistan û Cinnistan navdar e..Di hinde romanên wî de, wekî (Li welatê Mehdî) û (Di nav Kurdistana asê re), diyar dibe ku ew ketibû bin hikariya Rojhilatîyan...



Karl May (1842-1912)



Wêneye dawî (1912 li Vîn)

**Karl May** ji malbateke hejaran bû, ew zarokê pêncemîn bû, di nav 14 zarokan de, ku 9 ji wan yekûyek ji ber hejariyê, nexweş ketin û mirin. Dilê wî di ciwaniyê de li ser musîk û helbestê bû, fantaziya wî bi zûkî diyar bû, û dest bi xwendina xwe ya wêjevanî di sala 1865 li Waldenburgê kir, hema ji ber ku wî şeş mûmdan dizîyan, ew ji dibistanê hate avêtin. Pişt re ew pir caran ji ber diziyê an bedkariyan hate zindankirin, û di zindanê de dema xwe bi xwendina pirtûkan derbas dikir, û bêtir pirtûkên ku misiyoner û rêwîyan, dîrokvan û olnasan, li ser gelan û welatên dûr dinivîsandin... Weku ew bi zûkî pir caran hatibû girtin û tawanbarkirin, wilo jî, demekê pişt re, wî bi zûkî baştirîn xilatên wêjevaniyê standin. Bi ser de jî, li Amerîka belgenameya Doktorîya Rûmetê (*Doctor honoris causa*) ji aliyê zanîngeha Amerîkî ya Almanî ve, li Chicago, bo wî hate dayîn.

Ew carekê, bêtir ji sal û nîvekê bi Rojhilat ve, ta Sometra, li gel jina xwe çûbû... û paş ku kevirê jina xwe avêtibû „berda bû“ jineka dî ji xwe re anî bû. Û ji ber ku ew piştvaniyê bizavên aştîyê bû li Europa, û romaneke wî jî bi navê (Aştî li ser rûyê zevînê - 1905) heye, têkiliya wî bi nivîskara navdar û hilgêra xilat Nobel, **Bertha von Suttner** re, berî mirina wî hebû...Niha **Karl May** yek ji stûnên mezin ên romana almanî têye dîtin û li ser wî pir hatiye nivîsin, mal û gora a wî hatine parastin, mûzeyek bi navê wî heye, û civateke wêjevanî û bo ger û geştê jî bi navê wî heye...



Gora Karl May

Romana (**Di nav Kurdistana asê re**) gelek caran hatiye çapkirin, ji ber ku di nav zarokan de, wekî çêrok û romanên wî yên dî, pir hatiye û ditê belavkirin. Wekî kasê û sêlikên dengê jî, bi gelek terzan hatiye amadekirin. Bo vê yekê, navê **Kurdistan** û dîmenê **Kurd**, ji zarotiya milyonan mirov ve, li Almanîya, li Swîs û Austriya, bi şeweyekê baş û erênî, cîhê xwe girtiye, û bi taybet di sedsala çuyî de, hema mixabin, em Kurd bi xwe dîmenê xwe qerêj dikin...

Çapa ku di destê min de niha, sala 1951ê, ji aliyê weşanxaneyê (Karl May Verlag) ve li Bamberg, di bin jimareya fermî (ISBN 3-7802-0002-3) de, bi serpereştiya **Dr.E. A. Schmid**, hatiye derxistin. Di destpêkê de hatiye nivîsîn, ku bûyerên vê romanê di salên 70ê de, yên sedsala berî çapkirinê, çêbûne. Ev çapa romanê ji 654 rûpelane.

Di romanê de, gelek caran navê **Kurdistan** hatiye nivîsîn û pesindariya gelê **Kurd** û mirovê **Kurd** pircarkî hatiye gotin, tevî ku carekê an du caran nivîskar **Kurd** ji wan gelên ne pêşkêftî, ne şareza û nîvhov dijimêre, û carekê jî di nav gotinên lehengê romanê de, dizîna hespan li ba Kurdan weku serohateke hêja ya mêraniyê dide diyarkirin...

Di romanê de, pir peyvên kurdî, ku hinek ji wan niha tew bi kar nayin, hatine paristin, û romaner baş û jêhatî li ser êl û navçeyên Kurdistanê, li ser deşt û çiyayên û newalên wê, dizane û rêzgirtinê bo serohatên civaka kurdî ya axatîyê dide xuyakirin. Ew pesindariya cil û berg û hinek xwarinên Kurdan jî dide...Li ser wêrekiya mêrên **Kurd** jî dubare dike...

Lehengê romanê **Kara Bin Nemzî**, yê ku di romanên li ser **Îndiyana** de jî heye, di romanê de, bi Kurdan re bi zimanê kurdî dipeyive, û ew xwe wekî dostê Kurdan dibîne, rabûn û rûniştina wî di nav wan de, wekî yên wan in, mirovên kurd pir ji wî hez dikin. Bi taybet Kurdên **Êzdî**, ku li ser wan û li ser ol û serohatên wan, di vê romanê de, baş hatiye lêkirin. **Kara Bin Nemzî** ne tenê dost û hevalê wan e, belku ew amedeye teviya dewleta **malbata Osmanî** bi xwe re bike neyar, da kurdên **Êzdî** yên serhildêr ji hêrişên **Osmaniyan** biparize. Ew di cengê de harîkariya wan dike, û leşkerê dewletê dişikîne...

**Karl May** bi şaşî, Kurdên **Êzdî** bi „**Şeytanperest!**“ dide navkirin, hema di teviya romanê de, **Êzdî** sireke hêja û erênî, ji her aliyekî ve, dilîzin. Ew serhildana **Êzdiyan** li hember dewletê wekî mafekî rêbaz dibîne, wêrekiya wan di cengê de, tev li nazikiya wan ji aliyê olî ve tîne zimên û hikarbûna lehengê romanê, **Kara Bin Nemzî**, bi wan û bi hêjabûna civaka wan, xuya dike.

Ji aliyekî dî ve, **Karl May**, di romana xwe de, ku bûyerên wê li navçeyên **Şengal**, **Şêxan**, **Akrê**, **Îmadiyê**, **Mûsil**, **Berwarî** û **Zab**, bi terzekî fantazî hatine pêdakirin, dîmenê şêxên **Ereb** jî baş dide lêkirinê, hema ew gelek caran tinaziya xwe bi **Turkan** dike, wan di romanê de gelek nizim dike, heta bi şeweyekî nijadperest jî davêje ser wan. Di romanê de, karbidestên Turk li Kurdistanê reşwetxur û talankirin, malê gel û yê dewletê didizin û hovîtiyeke bê wekanî li hember Kurdan dikin, bi taybet dijî Kurdên **Êzdî**, û di rastîniyê de ewana bi xwe, li gor lehengê romanê, erzan in, pir tirsokin, newêrekin...

**Karl May** rêzgirtina xwe li hember hersê olan (Islam, Ezdahî û Filetî) li ser zimanê kesayetiyên romanê dide xuyakirin, lê belê hem Kurdên **Berwarî** û hem filehên **Tiyarî**, wekî mirovin li paşmayî, dizkar û keleş, dide xuyakirin, tevî ku di nav wan de jî mirovên hêja di romanê de hene û sira wan di piştvanî û paristina lehengê romanê û rêhevalêd wî de xort e.

Li dawiyê, ez dikanim bibêjim, ku **Karl May** dîmenekî hêja yê gelê **Kurd** daye qelemkirinê, ku wê di dîroka wêjevanîyê de heta-heta bimîne, wêneyê mirovên **Xwedatirs**, bi xwe bawer, ku rêwî dikane piştî xwe bi wan girê bide...Ewana wekî di romana **George Halban (Malikê gur)** de, wêrekin, mirovhezîn, paqijîn, rastiyan û diristin, tevî ku piçekî paşmayî û nezan in...